Federasyona Futbolê ya Tirkîyê daxwaza tîma Diyarbakirsporê bo guhertina navê tîma wan bo Amedspor qebûl kir. Ji vir pê ve tîma Amedê dê wek (Amed SK) were naskirin. Tîma Diyarbakir Sporê ya Bakurê Kurdistanê ku di Lîga 2yê ya Tirkîyê de dilîze daxwaz ji Federasyona Futbolê ya Tirkîyê kiribû ku razî bibe li ser guhertina navê tîma wan bo Amedspor. Serokê As ê Amedsporê Nurullah Edemen ragihand daxwaza wan ji aliyê Federasyona Futbolê ya Tirkîyê ve hatiye pesendkirin û got, êdfî ew dê bi navê Amed SKê di lîgê de tîbikoşin. Nurullah Edemen herwiha diyar kir ku rengê tîmê



dê kesk, sor û spî be. Tê zanîn ku, Hikûmeta Tirkîyê beriya niha navê kurdî li Bakurê Kurdistanê û Tirkîyê red dikir û navê malbat, bajar û gundan dikir tirkî, lê di çend salên dawî de dîsa gellek ji wan navên kurdî li wan cihan hat vegeandî.

Çîrokek folklorî- Masîvan û Mîr

Li mîrşînekê ji mîrşînan, di demeke kevn û bûrî de, masîvanek belengaz û feqîr hebû,rewşa wî ya aborî pir teng bû, rojekê jî rojan derket ser karê xwe û tora xwe avêt avê, li hêviya dana xwedê ma ku çend masîyan jê re bişîne, da wan bifiroşe û nanê kuffletê xwe pê peyda bike, piştî demeke dirêj bihûrî, masîvan tora xwe ji avê kişand, li nav gerîya û dît ku çend masîyên bêbiha ketine tora wî de ,lê yek ji wan masîyan pir seyr û balkêş bû, ji xwe re got eger ez vî masî bibim bazarê, buhayê wî dirhemek e û ez tiştêkî jî ve seyrbûna wî qezenc nakim, çima ez vî masî naxim sepeteke camînî de û nakim wek dîmenekê û diyarî mîr nakim, ew ê ji kêmanî dînarekî bide min. Masîvan masîyê xwe yê seyr kir wek dîmeneke ciwan di hewdekî cam de û bir jî mîr re, dema xatûn, hevîna mîr, ew masî dît, pir kêfa xwe jê re anî û ji mîr re got: Ev masî



dîmeneke pir ciwan e eger tu deynî diwana xwe. Masîvan ji mîr re got: Mîrê min, min ev masî aniye diyarî ji we re, ez bi hêvî me cihê kêfxweşî û rizamendiya we be, dema mîr dît ku masîyê wî seyr û ecêb e û bi dilê jina wî ye jî, bi dilekî xweş jî berdestkê xwe re got: Sed dînarî bide vî kesê qenc û birêz û hurmet, masîvan sed dînarên xwe birin, kêfxweş çû nav kuffletê xwe, dilê jina xwe û zarokên xwe jî bi birina keresteyên xwarinê xweş kir, wî hizir kir ku her kesek ji kuffletê mala wî jî çî hez dike, ew tişt jê re bir. Jina mîr dît ku hevserê wê ev merdî û qencî bi masîvan re

kir, pir qeherî û zivêr bû û ji mîr re got: Ev çî merdiya ne di rê de ye, buhayê masîyê wî li bazarê ne dînarek e te çû sed dînar dayê, divê tu wan dirawan vegeirî, erê tu mîrî, lê tiştên ne di rê de nebaş in, mîr got ezê çawa vegeirînim, jina wî jê re got: Tê bişîne pey masîvan, dema ew bê, tu dê jê bipirsî, masîyê te nêr e yan mê ye, eger wî ji te re got nêr e, tê bibêjî min yekê mê divê, eger wî got mê ye, tê bibêjî min yekî nêr divê, tê bi vî şeweyî dirawan vegeirî. Mîr şand pey masîvan, dema hat ew pirs jê kir, masîvan kenî û got: Mîrê min: Çendî aqilê we mezin e, hûn bîra her tiştî dibin, ta nêrbûn û mêbûna masîyan jî ne dîrî zanîna we ye, ez dizanim tu vî pîrsê dikî ji bo tu asta aqil û hişê min bizanî, bi xwedê mîrê min masî ne û di nav avê de ne, em wan digirin û difiroşin, me rojekê jî xwe nepirsîye, ev masî nêr e yan jî mê ye? Em kesên feqîr ne tenê feqîrê pereya ne, lê belê xwedê hişê me jî kêmbû daye, mîrê min: Hema xwedê hişê we yê şiyar û ramanên we yên kûr û dîr ji me re bihêle, em ji xwedê tiştêkî zêdetir naxwazin. Mîr nema dizanîbû çawa dê xwe ji vî danûstandinê derxe, û ditirsiya masîvan nêrbûn û mêbûna masî jê bipirse, mîr jî berdestê xwe re got: Sed dînarê dijî bide vî kesê ku hurmeta mîran digire, masîvan sed dînarên xwe birin û çû, di rê de dînarek jê ket, zû xwe tewand û rahişte wî dînarî, maç kir û danî ser serê xwe û vegeand bîrika xwe. Jina mîr ev bûyer dît, ku çawa masîvan bi zîrekî xwe ji pîrsa mîr ruha kir, ji hevserê xwe re got: Ev kesê ku te ev merdî pê re kir, ne hêja ye vî qenciye, te dît çawa xwe kir koleyê dînarekî , ne got min du sed dînar qezenc kirine û bila ev dînarê ketî jî feqîrêkî re be, ku di rê de ji xwe re bibîne. Mîr bawer kir û careke dî bi gotinên wê daxbarbû û dîsa ket bîntengiyê, careke din şand pey masîvan û jê re got: Min nizanîbû tu ev qaşîkîz û çavteng î. Berî ku mîr gotîna xwe berdeyam bike , masîvan got: Ez bawerim tu li ser rahiştina dînar û maçkirina wî dibêjî , mîrê min: Ez bi xwedê kim rahiştin û rêzgirtina wî dînarî, ne ji ber buhayê wî bû, lê ji ber dîmenê cenabê we li serbû, min nexwest wêneyê we li erdê û li nav lingan bimîne û bînpê bibe . Mîr careke dî li berxweket û jî berdestê xwe re got: Sed dînarê dî jî bidê, û bang li niviskarê diwanê kir û got: Binivîse: (( Kesê aqilê wî ne ji kîsê wî be, dê her û her ziyana para wî be)). Berhevkirin: Şiyar Silêman

Pakêtek çîps bi qasî 5 lître rûn ziyane dide

Kesên ku rojane pakêtek çîpsên petatan (kartolan) dixwin, weke ku salane 5 lître rûnê xwarinê bixwin, ji xeynî ziyane xwê, şeker û rûnê ku di amadekirina wan de tîn bikaranînin. Piştî hewldanê zêde, şirketên çêkirina çîps hejmareke zêde ya xelkê bi berhemên xwe ve girêdan da ku rojane berhemên wan bixwin. Baca xwarina çîps ne hêsan e. Li welatekî wek Amerîka li gor lêkolînekê, çîps mezin-tirîn hokara qelewiya amerîkiyan e. Çîpsên kartolan yek ji hokarên jidayikbûna zarokên lawaz û zeif in û dema zarok ew dixwin bandor li ser geşbûn û saxlemiya wan dibe. Lêkolîneke li Brîtanyayê jî dibêje, ew jinên ku bi rêjeyeke zêde kartolan di dema ducaniyê de dixwin, bi qasî kişandina cigareyan ziyane digihînin zarokên xwe.



Cegerxwînê Salihîyê

Eziz Xemcivîn



Xelilê Remo hevalekî min î pir delal, dihate cem min, ez diçûm cem wî, me gelek roj û şev bi hev re buhirandine. Gelek mey di şevên tarî de ji Denê Diyalokên xortaniyê vexwariye.!! Me li ser pertûkên (Markis û Lênin) qirik li hev zuha kiriyê, Xelil pertûkên Markis” (Capital) an jî Sermiyandarî” û her deh cildên “Hilbijartnên Lênin” gelek avjenî di wan de kiriyê; mirov çî pirs ji wî kiriba, dikaribû bersiva te bi cidiyeteke heja bida bi rastî jî me gelek rojên xweş bi hev re derbas kirin Xelil ne tenê xwendakar bû, belê carcaran diçû bal Cengîzخان Qirqatî û xwe fêrî fikana bilûrê jî dikir.!! Carekê jî min re got: Kekê Ezîz ma tu ji xwendina pertûkên Cegerxwîn tîr nabî?? Min gotê birayê Xelil; peyvên Cegerxwîn, Cezîrî, Feqe û Xanî..hd gogikên xwîna min in; û heger ewan nexwînim wê dilê afrandinê biraweste.!!

Rabû li min vegerand got: Ez jî ji Cegerxwîn hez dikim, lê divê merov helbestên gelek bixwîne, min gote wî weke kê? Li min vegerand: Va ye mamostê min Cengîzخان Qirqatî ne kêmî seydayê Cegerxwîn e!! Min gotê malneket; çawa yekî wek seydayê Cegerxwîn heye û milet pê nebihîstiyê.!! Got tu bawer nakî em ê sozokê jî wî bistînin û em li gel hev dê biçin bal wî. Me li hev kir, sozek ji Helbestvan Cengîzخان stand, û li ser soza xwe em çîn mala Helbestvanê heja!!

Hîn tiliya min li ser morîka Zengil bû, derî vebû; Ya star; ez çî bibînim, bêtir ji sed û pênçî Pisîkî\* li hewşa apê me Cengo bûn. Wa ev çî ne? Xelil bisirî û got: Mamostê min ji Pişikên gelekî hez dike. Em hêdî hêdî derbî hundir bûn lê ez ditirsiyan ko pêlî çêlikekê bikim. Rewşa hundir ji ya derve ne çêtir bû, Pisîkek sor li ber devê derî çêlikekên xwe şîr dida, û yekê teriya xwe dialast, û yekê xwe bi Helbestvan difirand. .... Di çih de mala Bircê Bardo hate bîra min.!! Du Tembûr li ser Diwarekî û li kêleka wan du Bilûr û Kodêk Tembûrê nivkolayî ew jî li ser Serşoka Ddê bû. Li ser Palgehê Pertûkeke Cegerxwîn bû; her awira min dikete tiştêkî ji van tiştan Xelil jî devla wî ve bersiv dida.!! Ev mamostê min Cengîzخان e, Helbestvan e û Tembûrêkê xweş lê dide, Tembûran çê dike, bilûrvan e, û berberiyê jî dike... tamam..... Ser çavan.

Bi ser min de jî zivirî û got ev jî Ezîz Xemcivîn e, nuh dest bi danîna Helbestan kiriyê, lê xwendevanekî jêhatiyê, Pertûkên Cegerxwîn ên di nav destên me de baş xwendine... Gava behsa xwendina Pertûkên Cegerxwîn bû apê Cengo qûna-qûna bû, û xwest gotinê ji ser dagerîne; rabû Xelil jê re got: Mamoste ka ji me re çend Helbestên Cegerxwîn bixwîne... Cengîzخان rahişt pertûkê û baş ji me re xwend...


Lê ez çûbûm ku li Helbestên wî bi xwe guhdarî bikim li ser gotina Xelil; tu nabêjî Xelil dixapand Helbestên Cegerxwîn jê re dixwendin û digot ev min nivîsandine!! Min xwendina wî birrî û jê re got: Apê Cengo ez hatime li Helbestên te guhdarî bikim? Ma rawestiyayî; wê çî bibêje; ji ber jî Xelil re gotibû: “tu Helbestvan di pey Cegerxwîn re ji min pê ve kes nîn e, gerek Kurd min li Şikeftêkê deynin, tenê Pelg û Pênivîsan ji min re bînin, û bêjin apê Cengo tu bes Helbestan ji me re bini-vîsin”. Berçavka xwe hinekî nizim kir û di ser çavîkan re bersiva min bi sistî da û got: Ez bi xwe Helbestan nanivîsinim, lê min Helbestên Cegerxwîn weke navê xwe jî ber kirine...!!

Bi xêra mîr Celadet Bedirxan zimanê me bûye zimanê nivîsandinê

Erê Mîro! Bi xêra serhildan Botan giyanê kurd-perweriyê di hinavê bav û bapîrên me de hat çandin. Erê mîr Celadet Bedirxan! Bi xêra ked û westa te, bi xêra Hawar û Ronahiya te, bingehê edeb û wêjeya kurdî ya nûjen, bi tîpên latîfî li ber me hat vekirin.

Belê, bi xêra mîr Bedirxanê mezin, kur û neviyên wî, roja îro em xwe peyebilind di nav netewên cihanê de dibînin; bi saya mîr Bedirxan yekemîn serhildana kurdî ya netewî destpêkiriye. Bi saya kurê wî Miqdad Medhet Bedirxan, bingehê rojnamevaniya kurdî ji me re hatiye danîn û bi saya neviyê wî mîr Celadet Alî Bedirxan û Hawara wî, hîmê zimanê me hatiye danîn, zimanê me bûye xwedî alfabekek xweser. Zimanê me jî axaftinê bûye zimanê nivîsandinê ku roja îro piraniya kurdan bi alfabe ya wî dixwînin û dinivîsin.

Erê, bi xêra herdu kovarên mîr Celadet Bedirxan; Hawar û Ronahî û Stêr û Roja Nû yên birayê wî Dr. Kamîran Bedirxan nivîskar û helbestvanên bejin bilind di hola afirandin û çanda kurdî de hatin xuyakirin, mîna Cegerxwîn, Osman Sebrî, Qedrî Can, Hesen Hîşyar..hwd. Hem jî bi weşana Hawarê re, helbesta



kurdî ya nûjen bi pênûsa Mîr Celadet, Dr. Kamîran û Qedrî Can û kurteçiroka kurdî ya hunerî bi pênûsa Dr. Nûreddîn Zaza serê xwe bilind kirin. Eger mirov li dîroka malbata Bedirxaniyan vegere û

berpêl bike, wê bibîne ku Bedirxanî bi tevayî di sirgûn û zivariyan de hatine kuştin û mirin. Ev yek dihêle ku em navê wan bi tîpên zêrîn di dîroka gelê xwe de binivîsin. Mîr Celadet yê ku gotiye: Miletên bindest heyîna xwe ji serdestên xwe bi du tiştan, bi du qeweta, du çekan diparêzin: Ol yek, Ziman dudo. Lê heke ola miletê serdest û bindest yek bibe, hingî çek yek bitenê ye, û bend tenê ziman e.

Mîr Celadet Bedirxan, bi vê helkeftê jî mîrzade Sînemxan Celadet Bedirxan re dibêjim: Ezbenî Sînemxan! Bav û bapîrên te bingehê kurdewariya resen ji bo me kurdan danîne û wek ku kurdan gotiye: Heçî berê gula zerê. Ez jî, gulek ZER wek zerbûna roka ku di nav rengên ala me Kurdistanê de diçirîne, pêşkêşî cenabê te dikim. Her wiha silavên gerim ji bajarê Cizîra Mîr Şeref û medreseya Mîr Evdal. Ji Çiyayê Cûdî û keleka Nûh pêxember. Ji Melayê Cizîrî û Baxê Îrem. Ji medreseya Sor û qutabiyan wê. Ji Îsmail Ebû Elizê Cizîrî û afrandinên wî. Ji Seqlanê Mema û peravê çemê Dicle. Ji Çiyayê Herekolê Azizan û pezkoviyên wê. Ji Burca Belak û Şaneşinê. Ji te re pêşkêş dikim.

Konê Reş

Akif Hesen

Barzanî û gengeşeya serokatîyê

Di van rojan de gengeşeyek li ser nûkirina serokatîya birêz Mesûd Barzanî geş dibe û hewildan ji aliyê hêzên rikber ve hene ku rê li pêşiyê bigirin ku careke din serokatîya wî were dirêjirin. Herwiha, hewildan hene ku hêza serokatîyê û selahiyatên wî jî werin bisinorkirin. Bêguman tê gotin ku ev tev bi navê demokrasiyê û tîrsa ji „dîktatoriyetê“ tîr kirin. Ev hewildan tev di bin kirasê ku divê destûra herêmê were parastin, tîr pêkanîn.

Ger li welatekî sistêm û çanda demokratîk tune be, serok bi rîya hilbijartinan û bi şeweyekî demokratîk jî were ser hikûm, ew dê bi demê re bibe dîktator. Ger bi xwe nebe dîktator, ew gelê, ku ji çanda demokrasiyê bêpar, wê wî di dawiyê de bike dîktator.

Bêguman divê serok û dezgeha serokatîyê bi saziyên demokratîk, wek parlamento û çapemeniyê, werin kontrolkirin. Ger ev herdu sazî kar bikin dîktatoriyet nikare zû zû cih bigire. Bawer dikim li Kurdistanê, di van salên dawiyê de, hem parlamento û hem çapemenî bi şeweyekî baş dixwebitin û rola xwe ya kontrolkirinê, kêm-zêde, pêk tînin.

Li hember demokrasiyê û hêjayên wê, li hember destûra herêmê û zagonên wêstukura me ji mûyekî ziravtir e, lê gelo mirov dikare wisa bi çavên girtî li demokrasiyê û pêvajoya wê binêre? Gelo mirov dikare di vê dema wisa nazîk de wisa sere-sere li şert û mercên ku xwe li Kurdistanê pêçandin binêre? Demek hebû di sistêma sosyalîzmê de digotin divê herkes wek hev bin, ev yek jîpiştê di zanistîya siyasî de wek „wekeheviya kor“ hat binavkirin. Hebe nebe, navê wê demokrasiya ku ji lêvan danekeve xwar û şert û mercan nas nake wê „Demokrasiya Kor“ be.

Bawer dikim gumana me tevan tune ye ku, di pêvajoya demokrasiyê de, Amerîka yek ji welatên xwedî te-crûbeyeke gelek dewlemend e. Bawer



dikim wê gumana me tune be ku gelê Amerîkî, di warê demokrasiyê de, gelêkî tégîhiştî ye.

Di makezagona Amerîkî de nehatiye diyarkirin ku nabe serokekî/e Amerîka jî 2 caran zêdetir bibe serok, tenê piştî şerê cihanê yê duyemîn, di sala 1947 de, bi zêde-xalekê (Twenty-second Amendment (Amendment XXII. serastkirina bis û duyemîn) tê nîşandan ev yek. Serokê Dewletên Yekbûyî, George Waşington, du caran bûye serok û ev yek piştî wî dibe mîna kevneşopekê û cihê xwe di çanda Amerîka ya siyasî de digire. Piştî George Waşington her 43 serokên Amerîkî, ji John Adams ta Barack Obama, an carekê an du caran hatine hilbijartin. Yanî kesekî ji George Waşington zêdetir serokatî nekiriyê. Gelo jî vê qaideyê re qet ti îstisna (ve-jart) nebûn?

32emîn serokê Dewletên Yekbûyî yê Amerîka Franklin Delano Roosevelt (1882-1945) di sala 1932an de cara yekem tê hilbijartin, di 1936an de cara duyem, di 1940an de cara sêyem û di 1944an de cara çaremîn dibe serokê Amerîka. Yanî tê fêmkirin ku di Dîroka serokên Amerîka de Roosevelt ne tenê du caran lê belê 4 caran bûye serok û gava serok bû çû li ser dilovaniya xwe. Ev tev wateya ku di demokrasiyê herî pêşkêti de jî rewşên awarte nahêlin mirov bi çavên kor û wek qaliban li zag-

onan binêre û nahêlin mirov rêberên, ji qeyranan re dikarin bibin derman, wisa rehet rehet bide aliyekî.

Çawa Amerîka jî şerê cihanê yê duyemîn wek hêza yekane û herî mezin derket û dîrokê îsbat kir ku partiyên opozisyonê di tawanbariyên xwe de neheq bûn û Roosevelt yek ji serokên Amerîka yê herî demokrat û herî serkeftî bû, wusa jî dîroka Almaniya, Adenauer weke serokwezîrekî demokrat û serkeftî binav dîke.

Dubare dikim, serok û serokwezîr dikarin ji bo demên dirêj desthilatdar bimînin û wê tîrsa dîktatoriyet û totalîterîzmê nebe ger mekanîzmên kontrolkirinê, mekanîzmên demokrasiyê, wek parlamento û çapemeniyê kar bikin.

Ka em li şert û mercên ku Kurdistan îro tê re derbas dibe binêrin:

Rewşa Aborî:

Rewş di qonaxeke xerab de ye. Nijadperestên Iraqê peryan li ser Herêma aborî xeniqandineke siyasî û civakî pêk bînin. Bazara dinyayê di rûyê Kurdistanê de digirin ku nekaribe petrola xwe bifiroşe, ji bo rêberên wê dakevin li ser çokan û îtaeta wan bikin.

Iran û Tirkîyê nikarin bidesxistina Kerkukê û Şingalê li ser xwe de daqurtînin, hemû dolaban dizivîrin, hemû fenûfîtkên siyasî bikar tînin ji bo van deskeftîyan pûçderînin. Gelo partiyên opozisyonê (Yekîti, Goran, partiyên îslamî) van listîkan dibînin? Gelo dizanin ku li her hêlê dafkên xeddar li hember Kurdistanê tîr vedan? Heger nizanin divê şiyar bibin. Heger dizanin û dîsa jî welat, di vê dema dîrokî de, dehft didin ji bo bikeve vê çala ji gengeşeyan, wê demê qedera miletê me dikin qirika şûşê ya teng de.

Rewşa Siyasî:

Welat di şerekî dijwar de ye û xeter gelek mezin e. Daiş hêzeke dinyayî ye û xwedî îmkânên gelek mezin e. Radîkalîzma (tandrewiya) olî bi nijad-

perestiya erebî re dibin yek û herdu bi hev re dibin pêtek ji agir di rûyê gelê kurd de. Herwiha, ev hêz ji aliyê hêzên herêmî ve weke jokêr tê bikaranîn. Ev 20 sal in şûrê Demoklîs yê hêzên herêmî li ser stuyê gelê kurd bû, lê dîsa jî rêberên wê mêzîna siyasê xweş bikar anîn û bi livên nazîk karî welatekî bibe nîmûne bînin holê. Gelo wê ne cihê mixabîniyê be mirov rê bide vî şûrî careke din vî welatê ewqas hûr-hûr hatî lêkirin bike tuneleke tarî de?

**Rewşa Dîrokî:** Sînorên Sykes Picot piştî salên dirêj diherfin û şansê mezin dikeve destê Kurdistanê ku bigihe sînorên xwe yê heqîqî, bigihe serxwebûna xwe. Piştî sed salan ji şer cara yekemîn e ku em dibin xwediyê Kerkûkê û digihin dewlemendiyan xwe. Cara yekemîn e ku dewletên wek Amerîka îşaretan didin ku dikarin serxwebûna Kurdistanê qebûl bikin.

Heger emê dîsa, weke dema hilweşandina Imperatoriya Osmanîyan, bi perçebûna xwe, sîdê ji fersendan wer-negirin, emê kêşeyên piçûk (berjew-endiyên teng ên partîyan) bidin pêş û kêşeya netewî bikin qurban, wê demê dîrokê li çavên me binêre û bêje: „Hûn rêberên jî rê der in û weke milet we heq nekiriye bibin dewlet“.

Tê fêmkirin ku dema îro em tê de ne nêzikî dema ku serokê Amerîkî Franklin Delano Roosevelt tê de bû. Gelê Amerîkî bi xetera pêvajoyê dihesiya lewma 4 caran maf da serokê ku ji heq dihat der û bi vî awayî jî karî biserbikeve.

Ger em jî weke gelê Amerîkî şiyar bin, bi xetera li ser welat û gelê me de hatî bihesin, heta fersenda dîrokî ya bi dest me ketî binirxînin, em dê bikaribin serbîkevin.

Lewma, di demek wisa de serokatîya birêz Barzanî were dubarekirin ne li dijî demokrasiyê ye, girîngiyeke demê ye û bersiva herî rast e ji şert û mercên nû re.

Qedrî Can, di Fîstîvala Ciwanan ya Ciwanan de helbestek diyarî Barzaniyê nemir kiriyê

Qedrî Can yek ji navên herî naskiriyê di nav cîhana helbest û nivîsa kurdî de, ew bi xwe xelkê Bakurê Kurdistanê ye û jiyana xwe li Rojavayê welêt debraskiriyê û li Şamê koça dawiyê kiriyê.

Qedrî Can li Dêrika Çiyayê Mazî jidayik bû, lê di derbarê sala jidayikbûna wî de çend nerîn di nav vekolê û nivîserên kurd de hene, 3 sal hatine danîn 1919, 1916 û 1911 lê piraniya nerînan sala 1911 an weku sala jidayikbûna wî helbestvanê kurd destnîşan dikin.

Ji ber rewşa ku li Tirkîye û Bakurê Kurdistanê de tê jiyankirin Qedrî naçar dibe ku berê xwe bide binxetê û li Amûdê û Qamişlo mamostatîyê dîke, piştê berê xwe dide Şamê.

Di 15ê Gulana 1932an de Qedrî Can di yekem hejmarê kovara Hawarê de nivîsareke xwe belav dîke, di sla 1936an de helbesta xwe ya bi navê (Reya Teze) nivîsiye û li gor çend vekolêrên kurd, ev helbesta pêşîn a nûjen û azad e di dîroka wêjeya kurdî de, lewra navê pêşengê helbesta nûjen ya kurdî li wî tê kirin. Mîna rewşên birêrî wê demê, Qedrî Can ne bi tenê helbestvan bû, di derbarê jiyana wî ya siyasî de jî nakokî di nav nivîskar û vekolran de peyda dibe, nerîneke dibêje wê digel komunîstên Sûriye de kar kiriyê, nerîna din dibêje ew endam bû di yekem partiya Kurdî li Rojavayê Kurdistanê de, ya din jî dibêje ew endamê komela Xoybên bû û nebûye endam ti partîyan din. Lê di sala 1957an de ew diçe Moskoyê û beşdariyê di fîstîvala cîhanî ya Ciwanan de dîke û li wir helbestekê diyarî Barzaniyê nemir dîke ew jî bi navê “Serdarê Kurdan Barzanî” ye.

Di sala 1959an de, desthilatdarên wê demê yê Sûriye Qedrî Can digirin û heya sala 1961 de, di zindana Mezê ya Şamê de dimîne, her di vê mijarê de Cegerxwîn dibêje: “Qedrî Can du-sê caran derbasî zindana Mezê bûye.”

Qedrî Can çend pirtûk jî zimanên din wergerandiye û ew kirine Kurdî, û helbesta wê ya Gula Sor dibe stranek û Ciwan Haco wê dibêje.

Di Tebaxa sala 1972an de li bajarê Şamê Qedrî Can koça dawiyê dîke û li gorî xwîna

Şêx Xalid li taxa Ruknedîn tê veşartin, ew bi xwe bavê du kur û keçekê bû: Mizgîn, Şêrîn û Serwer.



## Îran qebûl nake ku Tirkîye herêmake aram çêbîke



Pêwendiyên Îranê yê ligel Welatên Ereba û Afrîqa Hisên Emîr Abdulahyan ji televizyona dewletê re axivî û ragehand: "Parastina ewlekariya Tirkîyê bo me girîng e. Lê belê pêkanîna herêmake aram li bakûrê Sûriyê, bînpêkirina serweriya axa Sûriyê ye."

Abdulahyan amaje bi wê yekê da ku divê rêyek din bê dîtin û mafên nevdewletî neyên bînpêkirin û got: "Pêwîst nake hewldan û planên wiha navçeyê aloztir bike."

Çend roj beriya niha Cîgirê Serokwezîrê Tirkîyê Feridun Sinirlioglu ragehandibû ku ew dixwazin li bakûrê Sûriyê navçeyek aram çêbikin û hêzên tundra derbixin, li şûna wan Artêşa Azad a Sûriyê bicîh bikin.

Cîgirê Wezîrê Karên Derve yê Îranê Hisên Emîr Abdulahyan ragihand ku ew li dijî avakirina herêmake aram in li Sûriyê ji ber ku ew yek bînpêkirina serweriya axa Sûriyê ye.

Cîgirê Wezîrê Karên Derve yê Îranê û Berpirsê

## Peyama Amerîka bo kurdan: Bo xatirê şehîdan bibin yek

Alikarê Wezîrê Derve yê Amerîka û nûnerê taybet ê Obama di hevpeymaniya dijî DAIŞê de, Brett McGurk bangê watedar li partiyên siyasî yê Başûrê Kurdistanê kir: Ji bo xatirê xwîna şehîdan bibin yek!

Brett McGurk, ku ji Tirkîyê derbasî Başûrê Kurdistanê bû, yekser çû ba alîkarê Sekreterê YNKê Berhem Salih û pê re li ser kirîza serokatîyê li Başûrê Kurdistanê hevdiîn kir.

McGurk li ser rûpela xwe

ya twitterê peyamek watedar belav kir û got, ez niha li Herêma Kurdistanê me ji bo ku wan teşwîq bikim li dijî DAIŞê bibin yek û ev jî wefaya wan e li hember xwîna 1200 pêşmergeyên şehîd. Terorîst ji duberetiye mifayê werdigirin. Roja 8ê Tebaxê nûnerê taybetê Obama û şanda li gel wî, serdana bajarê Silêmaniyê kirin û ligel berpirsên YNKê û Tevergera Goran civiyan. Şandê ji partiyên kurdî yê Başûrê Kurdistanê xwest ku pîrsa serokatîya



herême û arîşeyên navxweyî bi hev girtin çareser bikin û herwiha serokatîya Barzanî jî bo 2 salên din ji dirêj bikin.

## Amerîka jî mûşekên xwe yê Patriot ji Tirkîyê vedikişîne

Amerîka jî biryar da sîstema parastina hewayî û mûşekên xwe yê Patriot ji Tirkîyê vekişîne. Wezîreta Derve ya Amerîkayê ragihand, heyama ku ji bo sîstema parastina hewayî û mûşekên Patriot ên ku sala 2013ê bi fermana NATO li Tirkîyê hatibûn danîn, Cotmeha îsal bidawî tê. Wezîretê eşkere kir ku êdî ew rêkeftin nayê nûkirin lê kengê lazim bû dîsa Amerîka dîsa dikare wan mûşekan vegeirîne Tirkîyê û da zanîn, ev yek ji hikûmeta Tirkîyê re jî hatiye gotin.



Çend roj berê Almanya jî biryar dabû mûşekên xwe yê Patriot, ku sala 2013ê bi fermana NATO li herêma Maraşê ya Tirkîyê hatibûn danîn, vekişîne. Almanya gotibû, êdî ti tehdî-

dek li ser Tirkîyê nemaye lewma ew mûşekên xwe yê Patriot ji Tirkîyê dibin. NATO bi hêceta ku Sûriyê dê bi mûşekên Balistîk êrişî Tirkîyê bike, mûşekên Patriot li wî welatî danibû.

Ew biryara hikûmeta Almanya di medyaya nêzikî hikûmeta Tirkîyê de wek nerazîbûna li hember operasyonên Tirkîyê yê li dijî PKKê hat nîrxandin.

## Dayikên Şemiyê ji bo rojnamevanekî ciwan kom bûn

Dayikên Şemiyê vê hefteyê jî ji bo peyamnêrê rojnameya Ogûr Gundemê Ferhat Tepe kombûn ku di 28ê Tirmehê sala 1993êyan jî aliyê leşkerên Tirk ve hatibû revandin û piştî 13 rojan termê wî hatibû peydakirin. Xizm û balbatên kesên wendayî ku weke "Dayikên Şemiyê" tene nasîn, di hefteya 452yan ya çalakiya xwe de li Stenbolê carek din kom bûn. Dayikên Şemiyê vê carê jî ji bo peyamnêrê rojnameya Ozgûr Gundemê Ferhat Tepe hatine balhev. Dayik û bavê Ferhat Tepe jî di çalakiyê de amadebû. Dayika Ferhat Tepe, Zubeyde Tepe li wir axivî û got: "Kurê min dema hate revandin 19 salî bû. Rojnamevanek ciwan



bû. Termê wî piştî 13 rojan li gola Xezêr de hat dîtin. 22 sal bê hiqûqî û dadwerî di ser de çû. Piştî ku li ser doza wî re 20 sal derbas bû, me bi nivîza dozger zanî ku doza wî jiber dem hatiye betal kirin. Li wî welatî kujer

nayên cezakerin, mexdûran ceza dîkin." Dayika Tepe bal kêşa ser bêhiqûqiya li Tirkîyê û got: jiber bavê wî gotiye "kurê min ji aliyê dewletê ve hatiye kuştin, salek cezayê zîndanê dane wî."

## ROJAVA- Herêmake dewlemend û miletekî perîşan

Rûdaw



Rojavayê Kurdistanê herêmake dewlemend û xwedî samaneke siruştî ye û piraniya dahata welatê Sûriyê ji navçeyên kurdî ye, lê xelkê wê heta niha ti xêrek ji van dahatan nedîtine û di nava hejariyê mezin de dijîn. Li gorî nerînen pîsporên aborî, derbarê dahata Rojavayê Kurdistanê, hatiye diyarkirin ku eger ew herêm serbixwe û aram be, dikare xwedî dahateke taybet be, ji ber ku piraniya dahata Sûriyê ji navçeyên kurdî ye. Aborînas dibêjin eger herêmake serbixwe li vê deverê were ragihandin wê serkitinê bidest bixîne. Rûbera Rojavayê Kurdistanê nêzikî 24 hezar kilometreyên duca ye. Hejmara niştecîyên wê jî nêzikî 3 milyon û 500 hezar kes e, ku piraniya wan Kurd in, ligel hinek kemîneyên weke Ereba û Aşûriyan. Endamê Komeleya Aborînasên Kurd li Sûriyê Xorşîd Elîka ragihand: "Yedeka stratejîk a petrolê li Rojavayê Kurdistanê 9 milyar bermil heye, ligel berhemdana 235 hezar bermil rojane, ku dibe bigihêje 3 hezar bermil rojane."

Xorşîd Elîka wiha got: "Bi ser

de jî gaza Swêdîkê tenê di sala 2011ê de rojane gihiştê 16 hezar çêrên gazê, ku ev jî rêjeyeke bilind e li gorî Sûriyê bi giştî. Herwiha Rojavayê Kurdistanê bi fosfat û çementoyê jî dewlemend e." Li gorî Elîka, dahata firotina petrola Rojava jî digihêje 500 milyon dolar, bi wateya ku tevahiya dahatan, di salekê de, digihêje 10 milyar û 800 milyon dolar. Ji aliyekî din ve, beşê çandiniyê jêdreke dewlemend e ji bo herêma Rojavayê Kurdistanê, ku zeviya çandiniyê digihe 18 hezar kilometreyên duca. Salane karîna berhemdana wê jî yek milyon û 400 hezar ton genim e. Herwiha berhema salane ya pembo, li navçeyên Rojavayê Kurdistanê digihe 273 hezar ton. Herwiha 15 milyon darên zeytûnan li vê herêma hene, bi rêjeya % 23 ji tevahiya darên zeytûnan li Sûriyê. Di her salekê de dahata berhema zeytûnan digihêje 750 milyon dolar û ya genim digihêje 372 milyon dolar û ya pembo digihêje 230 milyon dolar. Endamê Komeleya Aborînasên Kurd li Sûriyê Xorşîd Elîka

wiha got: "Rêjeya berhemdana pembo bilind e, ligel kaletîka baş a vî pemboyî. Herwiha ev herêm bi genim, ceh û kemûnê jî dewlemend e, bi awayekî ku rêjeya berhemdana genimê Rojavayê Kurdistanê % 45 ji berhema Sûriyê ye." Bi heman awayî samana avê li Rojavayê Kurdistanê jî 10 bendavan pêk hatiye û karîna wan a embarkirina 300 milyon metre duca heye, bi ser de jî 8 çem li wê derê hene, ji wan jî Xabûr, Dicle û Ferat, ligel dehên hezarên jêder û birên avê yê din ên weke baran û çavkaniyan. Tevaya dahata jêderên Rojavayê Kurdistanê jî petrol, çandiniyê û jêderên avê digihe % 55 ji tevaya hemû samana Sûriyê. Xorşîd Elîka wiha domand: "Heta niha rewş ne aram e, lewma weberanîn li Rojavayê Kurdistanê nîne, ji ber ku pêwîstiya weberanînê bi aramiya asayîşî û siyasî heye, lê hêj ev yek peyda nebûye, her ji ber heman sedemê sermiyanekî mezin ji Rojavayê Kurdistanê derket û hate revandin. Êdî ew çaverêyî rewşeke aramtir û baştir e ku careke din têkeve kar û derî ji sermiyanên biyanî re jî veke."

## Ewropa bûye xewna ciwanên Rojava

Sipan Xelil



Her ku dem diçe, xort û gencên Rojavayê Kurdistanê berê xwe didin dewlet û welatên Ewropayê, helbet bi mebesta dîtina jiyaneke xweş, ku piraniya wan gencan berê xwe didin welatê Almanyayê. Kurdên Rojavayê Kurdistanê, êdî jiyana ku niha tê de derbas dibin diyar e nema tehemul dikin, lewma ji welatê xwe derdikevin û berê xwe didin xerîbiyê. Derbarê sedemên koçberiyê Rojnameya Ciwan dixwest ku ji nêzik ve bîr û boçûnên xelkê Rojavayê Kurdistanê li ser vî mijarê nas bike, lewma ev rapor hate amadekirin. Sozdar Mihemed dibêje ku ew ji neçarî jî welatê xwe bar dikin û wiha berdewam kir: "Ti kes ji birçîna namîre, mebest jê reva me ne ji ber birçîbûnê ye, bi qasî ku ewlêzî li bajarên me nema ye, bi dehan hêz li Rojavayê Kurdistanê çêbûne û eger kesek tê girtin, girtina wî lixwe nagirin, mirov dê çawa li vî welatî bijî, ku tu kes nîne parastina min û malbata min bike."

Her wiha Emîn Omer derbarê koçberiyê got: „Biryarên Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) sedemên

sereke ne ji koçberiyê re, û biryara herî bi bandor ew e, biryara leşkeriya bi zorê ya ku niha Rojavayê Kurdistanê bîyê xort û ciwan hiştiye, divê ev partî dev ji van kiryarên xwe berde û bihêle ku Pêşmergeyên Rojavayê Kurdistanê derbas bibin û êdî xort nema ji welatê derkevin." Zehmetiyên ku penaber dibînin Di heyama çend mehên borî de ji vî salê, hejmarek mezin û mezin Rojavayê Kurdistan bi cih hiştine û berê xwe dane welatên Ewropayê, ku piraniya wan jî genc in. Ew gencên Rojavayê Kurdistanê, piraniya wan jî Başûrê Kurdistanê di riyên qaçax re berê xwe didin Tirkîyê, da ku ji wir derbasî Yûnanistanê bibin. Welatiyekî wiha behsa çûna xwe bo Ewropayê kir: "Piştî em derbasî Tirkîyê bûn, me rêkeftin ligel qaçaxçiyê xwe danî, helbet di rîya avê re ji ber ku pereyê wê ne gelek e, li ser avê em hatin xapandin ji ber ku belemeya me(qeyik) tenê 25 kes diketin nava wê de, lê wî zêdetir ji 30 kesî lê siwarkirin û vê yekê hişt ku em bin av bibin, ta ku polîsê Yûnanê bi hawara me ve hat. Me gelek zehmetî dît."

Berya çend rojan komeke penaberên kurd, ji xeniqandinê xelas bûn, ji ber ku 40 kes di nava belemeyek biçûk de bûn, ku dixwestin biçin Yûnanistanê, lê belemeya wan rastî kêşeyekê hat. Ev kêşe yek ji kêşeyên ku rastî penaberên Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê tî, ji ber ku derbasbûna Yûnanistanê tenê xelaskirina qonaxa yekemîn e ji çûna wan ya Ewropayê. Çare çî ye Rojavayê Kurdistanê niha rastî xetereke pîr mezin tê, ji ber ku demografiya deverê tê guherîtin û Ereba li şûna kurdan bi cih dibin. Heta niha ti kes bi cidî li ser vî pîrsgrîkê ranewestiya ye, çî ji Tevergeha Civaka Demokratî Têv-Demê, ku ew ji aliyê xelkê Rojava ve bi vî mijarê tê tawanbarkirin, çî Encumena Niştîmaniya Kurdî ya ku milet jê re dibêje ev yek ji encama lawazbûna ENKSê ye. Li ser vî babetê serkirdeyekî tevgera Kurdî wiha got: "Çare ew e ku Partiya PYDê ya xwe dibîne parêzvan dev ji kiryarên xerab berde û dest bi diyalogê ligel Encumena Niştîmaniya Kurdî bike û bendên Rêkeftina Dihokê cibîcî bike."

## Li Bakurê Kurdistanê şer û pevçûn berdewam dikin

Li Bakurê Kurdistanê şer û pevçûn di navbera hêzên Tiriyeyê û gerilayên PKKê de berdewam dikin.

Li navçeya Şemzînan a Colemêrgê şer û pevçûnan dîsa dest pê kirine û li Taxa Êrde ya Şemzînan di navbera gerilayên PKK û hêzên taybet ên Tirkiyeyê de pevçûn derket û di encamê de welatîyek birîndar bû.

Herwiha li çend taxên bajêr xendek hatina kolandin û Pira Nêrduş a di navbera Şemzînan û Geverê de jî hatiye hilweşandin û ji ber vê yekê çûnûhatina navçeyê zehmet bûye.

Herwiha Parlamentêrê HDPê yê Colemêrgê Adem Geverî jî da zanîn jiyana gundiyan Şapata Şemzînanê di metirsiyê de ye.

Hejmerek zêde gundiyan Şapatanê ku nifûsa wê nêzikî hezar û 500 kesî ye, ji ber tirsê êrişê jî aliyê hêzên taybet ên Tirkiyeyê û êrişên firokeyan ve ber bi çiyayan ve çûne. Tê gotin gerilayên PKKê çend xalên kontrolê niha danîne ser rêya Şapata û tevihiya kontrola gundî jî di dest gerilayên PKKê de ne.

Herwiha Li ser rêya bajarên Dêrsîm-Xarpêtê hêzên PKKê xala pişkinîna danîn û kamyonek şewitandin.

Hêzên PKKê li ser rêya Dêrsîm-Xarpêtê li nêzikî gundê Temirtaxê yê girêdayî navçeya Mêzgirê, rê girtin û kamyonek şewitandin û şofêrê kamyonan jî girtin.

Hat ragihandin li navçeya Kanîreşa Çewlîgê di bin wesayîtek leşkerî de mayîn teqa û di encamê de 3 leşkerên Tirkiyeyê jiyana xwe ji dest dan û 6 leşker jî birîndar bûn.

Li nêzikî gundê Hacilarê ser bi Kanîreşê ve rê hat girtin. Piştê jî bo rê vekirine leşkerên Tirkiyeyê ber bi cihê çalakiyê çûn.

Dema leşker ber bi cihê çalakiyê ve diçû di bin wesayîteke leşkerî



de mayîn teqa.

Parêzgarê Çewlîgê Yavuz Selim Koşger ragihand di encama bûyerê de 3 leşkeran jiyana xwe ji dest dan û 6 leşker jî birîndar bûn.

Hat gotin piştî bûyerê ewlehiya Tirkiyeyê li herêmê dest bi operasyonê berfireh kirin.

Li Bakurê Kurdistanê şer û pevçûn berdewam dikin

Li Bakurê Kurdistanê şer û pevçûn di navbera hêzên Tirkiyeyê û gerilayên PKKê de berdewam dikin.

Li navçeya Şemzînan a Colemêrgê şer û pevçûnan dîsa dest pê kirine û li Taxa Êrde ya Şemzînan di navbera gerilayên PKK û hêzên taybet

ên Tirkiyeyê de pevçûn derket û di encamê de welatîyek birîndar bû. Herwiha li çend taxên bajêr xendek hatina kolandin û Pira Nêrduş a di navbera Şemzînan û Geverê de jî hatiye hilweşandin û ji ber vê yekê çûnûhatina navçeyê zehmet bûye.

Herwiha Parlamentêrê HDPê yê Colemêrgê Adem Geverî jî da zanîn jiyana gundiyan Şapata Şemzînanê di metirsiyê de ye.

Hejmerek zêde gundiyan Şapatanê ku nifûsa wê nêzikî hezar û 500 kesî ye, ji ber tirsê êrişê jî aliyê hêzên taybet ên Tirkiyeyê û êrişên firokeyan ve ber bi çiyayan ve çûne. Tê gotin gerilayên PKKê çend xalên kontrolê niha danîne ser rêya Şapata û tevihiya kontrola gundî jî di dest gerilayên PKKê de ne.

Herwiha Li ser rêya bajarên Dêrsîm-Xarpêtê hêzên PKKê xala pişkinîna danîn û kamyonek şewitandin.

Hêzên PKKê li ser rêya Dêrsîm-Xarpêtê li nêzikî gundê Temirtaxê yê girêdayî navçeya Mêzgirê, rê girtin û kamyonek şewitandin û şofêrê kamyonan jî girtin.

Hat ragihandin li navçeya Kanîreşa Çewlîgê di bin wesayîtek leşkerî de mayîn teqa û di encamê de 3 leşkerên Tirkiyeyê jiyana xwe ji dest dan û 6 leşker jî birîndar bûn.

Herwiha li nêzikî gundê Hacilarê ser bi Kanîreşê ve rê hat girtin. Piştê jî bo rê vekirine leşkerên Tirkiyeyê ber bi cihê çalakiyê çûn.

Dema leşker ber bi cihê çalakiyê ve diçû di bin wesayîteke leşkerî de mayîn teqa.

Parêzgarê Çewlîgê Yavuz Selim Koşger ragihand di encama bûyerê de 3 leşkeran jiyana xwe ji dest dan û 6 leşker jî birîndar bûn.

Hat gotin piştî bûyerê hêzên ewlehiya Tirkiyeyê li herêmê dest bi operasyonê berfireh kirin.

## Tevgera Ciwanên Kurd ofîsa xwe li Başûrê Kurdistanê vekir



T Bi amadebûna şandeke fermî jî Encumana Niştîmanî ya Kurd li sûriyê (ENKS) û nûnerên aliyên siyasî û kesayetiyan rewşenbîrî û

civakî, roja Duşema borî Tevgera Ciwanên Kurd (TCK) ofîsa xwe ya herêma kurdistanê vekir. Bi vê helkeftê hin jî siyas-

etmedarên Rojavayê Kurdistanê hevî kirin ku berfirehbûna kar û çalakiyên TCK bandoreke erênî li ser bizava ciwanên Rojavayê Kurdistanê bike.

Serokê ENKS Ibrahim Biro pîrozbahîya vekirina ofîsê kir û daxwaza piştigiriya tevgerê kir da bikaribe bi berdewamî pêş bikeve û herdem geş û çalak bimîne. TCKê dibêje, ku heta niha wan karekî baş li Rojavayê Kurdistanê pêşkêş kiriyê û ew dê li ser xebata xwe berdewam bin.

Hêjayî gotinê ye ku TCK, saziyek xortan û serixwe ye. Di sala 2005an de hatiye damezrandin, û yek ji pêkhatiyên damezrênerên ENKS ye.

## Serok Barzanî 2 salên din dimîne serok

Biryar hat dan, ku Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî heta dema lidarxistina hilbijartinê di kursiyê serokatîyê de bimîne. Encûmena Şura ya Herêma Kurdistanê îro 17ê Tebaxê biryar da ku kursiyê Serokatîya Herêma Kurdistanê de li gor benda 9 a yasaya hejmar 14 a Encûmena Şura ya Herêma Kurdistanê ya sala 2008an ev biryarstandiye. Encûmena Şura li gor yasaya hejmar 13 a yasaya Wezaretê Dadê ya sala 2007an jî aliyê îdarî ve ketiye ser Wezaretê Dadê ya Herêma Kurdistanê. Ev encûmen erk, kar, amanc û pêkhatiyên wê li gor yasaya hejmar 14 a yasaya Encûmena Şura ya Herêma Kurdistanê ya sala 2008an

Encûmena Şura ragihand: "Biryara me hem biryareke şewirî ye û hem jî gerek were cîbicîkirin." Hat ragihandin, Encûmena Şura ya Herêma Kurdistanê di bersiva daxwazên Serokatîya Herêma Kurdistanê û Serokatîya Parlamentoya Kurdistanê de û li gor benda 9 a yasaya hejmar 14 a Encûmena Şura ya Herêma Kurdistanê ya sala 2008an ev biryarstandiye. Encûmena Şura li gor yasaya hejmar 13 a yasaya Wezaretê Dadê ya sala 2007an jî aliyê îdarî ve ketiye ser Wezaretê Dadê ya Herêma Kurdistanê. Ev encûmen erk, kar, amanc û pêkhatiyên wê li gor yasaya hejmar 14 a yasaya Encûmena Şura ya Herêma Kurdistanê ya sala 2008an



dubare hatiye rêxistinkirin û karên xwe cîbicî dîke. Encûmena Şura ya Herêma Kurdistanê jî 3 pêkhatiyên yasayî û îdarî yên Desteya Serokatî, Desteya Giştî û Dadgeha Îdarî pêk tê ku erk û fermanên wê encûmenê pêk tînin.

Li gor yasaya Encûmena Şura ya Herêma Kurdistanê, Desteya Giştî ya wê encûmenê şewir û nêrina yasayî ya xwe li ser wan mijaran dibêje ku ji aliyê wan wezaret û fermangehên negirêdayî bi Wezaretê Dadê ve arasteyê wê tînin.

## Rêjîma Esed li Şamê 120 kes kuştin

Firokeyên rêjîma Sûriyê li ser taxa Duma ya Şamê de bombebaranandin û di encamê de piraniya wan zarok û sivil 120 kes hatine kuştin, 300 kes jî birîndar bûn. Firokeyên rejîmê doh nava rojê li taxa Dumayê ku dikeve bakurê rojavayê paytex Şamê bombebaran kir. Riwangeha Sûriyê ya Mafê Mirovan ragehand ku firokeyan taxa di destê hêzên opzîsyonê de bombebaran kir û di encamê de piraniya wan xelkê sivil, 120 kes kuştin û 300 kes jî birîndar bûn. Rewangê di-



yar kir ku di nava kuştîyan de zarok û jin jî hene. Ajansa Reutersê jî bi zarê çavkaniyek ji artêşa rejîmê ev agahî piştrastkir û da zanîn ku êriş li dijî hêzên opzîsyonê pêk hatiye. Şahidên rûdanê jî

dibêjin firokeyan Duma bombebaran kirin û xelk piştî bombebaranê çûn ku di bin xirbeyan de mirî û birîndaran derbixin lê wê gavê carek din êriş pêk hatin û gelek kes di wê êrişê duwem de mirin.

## Komela Faris nexweşan bêberamber derman dîke

Komela Faris a Xêrxwazî sozname bi hejmerek jî doktorên Girkêlegê re girê rina daye derbarê çareserkirina nexweşan bêberamber. Komela Faris a Xêrxwazî sozname bi girûpek jî doktorên bajarokê Girkêlegê re girêdan ji bo çareserkirina nexweşan dest-teng û hewcedar bêberamber. Wê ev karê mirovahî jî roja Şemiyê de (15 Tebaxa 2015) dest pê bike. Ew doktorên xwebexş pirên coreyên tay betmendan di nav wan de hene. Wan doktoran amadebûna xwe ji alikariya çareserkirina nexweşan re bêberamber tekez kirine. Wê ew nexweş bi pêlêtin taybet ku wê ji aliyê Komela Faris ve bêne nişan bibin, piştî ku rewşa wan ya civakî û tenduristî li berçavan bê girtin. Hêja ye gotinê ku doktorên xwedane ber alikariyê taybetmendên van nexweşîya ne: Nexweşiyên hinavan û dil - Nexweşiyên guh



û bêvil û gewriyê - Nexerşiyên jinan - Nexweşiyên çerm - Neştergeriya giştî - Nexweşiyên hestiytan - Nexweşiyên mîzê - Taqîkirin - Pizîşkiya Giştî. Tê zanin ku armanca Komela Faris ew e ku alikariya desteng û hewcedaran û alikariya malbatên nexweşan û yên xwedan pêdiviyên taybet û pêkanîna serhejmarên tendurustî û civakî.

## HELEB - Lîreya Tirkiyê şûna ya Sûriyê digire



